Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1177 | 12-Pûşper-2024 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
rojnameyaronahi
@ronahikurdi55
nameronahi@gmail.com
Rojnameya Ronahî
+963 984 370 218

# 24 sal in ji bo veguhestina welatiyan di xizmetê de ye

**Ronahî Sadûn/Qamişlo**

**Ezîz Sîno 24 sal in bi basa xwe gundiyên Çeneqçîkê, Dîkê, Qijlê û Cewheriya vediguhêze bajarê Amûdê. Ezîz diyar kir ku armaca wî  ya sereke ji vî karî xizmeta gundiyan e.**





Ji dema ku mirovahî derketiye ser rûyê erdê û heta niha, mirov di nava pêşketinê de rûbirûye, lê nayê wateya ku tişên kevnare bêsûdin, ji ber mirov ji wan kevnareyan pêşketin nû ava dike, bi taybet wekî ku wê di mijara me de bê nasîn, pêşketina erebeyan û girîngiya wan. Di demê destpêkê yên mirovahiyê de, cûrbeneqlên yekem ku mirov ji bo pêwîstiyên xwe bikar anî, hesp an jî ker bûn. Herwiha yê herî zêde ev cûrbeneql bikar tanîn kesên ku li gundan jiyan dikirin, lê heta çi astê wan gundiyan di demên zivistanî de, zehmetî bi van cûrbeneqlan dikişnadin, ji bilî demên zivistanî lez û beza keran jî pir kêm bûn û pirî caran jî bi meşê diçûn bajar, lewra pêwîstiya mirovan bi erebeyên pêşketî hat dîtin, êdî di nava pêşketinê de bas û erebeyên cûr bi cûr hatin avakirin û derxistin.

**24 sal in karê şifêrtiyê dike**

Yek ji basên ku ev 24 sal in ji bo siwarên xwe, li ser riya 4 gundan kar dike, basa Ezîz Sîno ye. Ezîz di sala 1971`an de li gundê Çeneqçîkê yê girêdayî bajarê Amûdê ji dayik bûye. Di sala 2004`an de li ser basa ku zêdeyî 20 sawaran radike karê şifêrtiyê dike û heya niha jî di vî karî de berdewam e.Ji bilê roja înê, Ezîz her roj nêzî 6 caran ji gundê Çeneqçîkê, Qijlê, Dîkê û Cewher siwaran dibe bajarê Amûdê û wan vedigerîne. Herwiha xwendekarên ku bi vê basê diçûn bajêr ji bo dibistana xwe lê berdewam bikin, niha pirî wan jî bijîşk, mamoste, endezyar, parêzer, rojnemevan û hwd… in. Ezîz di van 24 salên karê xwe de berî ku di aliyê darayî de bihizire, di pêdiviyên siwarên xwe de dihizir e.

Derbarê 24 salên Ezîz yên li ser basê, Şifêrê Basê Ezîz Sîno ji rojnameya me re axivî.

Ezîz Sîno diyar kir ku ji sala 2004`an de karê şifêrtiyê dike û wiha got: "Ez ji sala 2004`an de karê şifêrtiyê li ser riya gundê Çeneqcîk, Qijlê, Dîkê, Cewheriya heta ku dighêje bajarê Amûdê dikim. Bi basa xwe ne tenê siwarê van gundan dibim bajêr, di heman demê de ji ber dibistan li van gundan tenê asta seretayî ne, xwendekar astên mayî li bajêr berdewam dikin, lewra ez xwendekaran jî dibim dibistanên li bajêr.

Ji xwe di dema ku dibistan vekirî ne, rojane 6 caran ji gund diçim bajar û vedigerim. Çûna min ji bajar re jî bi vî rengî ye, di seat 7`an de xwendekaran dibim bajar, ji bajar mamosteyan tînim gundê Qijlê, Dîkiyê, Çeneqîçîk û Cewheriya, piştî ku mamosteyan vedigerînim di seat 8`an de vedigeriya li eynî gundan siwaran dibim bajar û di seat 11`ê nîvro de siwarên xwe vedigrînim, herwiha di seat 12`ê nîvro de mamosetan vedigerînim bajar û di seat 1 dihêm bajarê Amûdê, wê demê şagirtên xwe vedigerînim malê. Rojane, ji bilî roja înê bas nêzî 16 km dimeşim û di dema 6 caran be, nêzî 90 km dimeşiyam."

**'Li gorî derfetên xwe bi gundiyan re dibim alîkar'**

Ezîz Sîno di berdewamiya axaftina xwe de da eşkerekirin ku demên basê yên dibistanan ji yên havînî cûda ye û wiha got: "Dema ku dibistan bi dawî dibe, demê basê tê guhertin, ez havînî seat 8 ji gundê Çeneqîçîk derdikevim dîsa eyîn gunda heya bajêr û di 12 nîvro de vedigerim. Di heman demê de di demên ku perwerdeyên mamosteyan di werzê havînî de hene, ez mamosteyên her 4 gundan jî dibim perwerdeyê û wan vedigerînim. Di sala ku min li ser basê kar kir kirya wê 10 wereqeyê sûrî bû, di wê demê de her litreyek mazot bi 7 wereqeyan dikirî û xiyara zeyta basê hezar 500 dikir, her 2 dolab bi 5 hezaran çê dikir. Di dema niha de buhayê her siwarekî base bi 4 hezaran e, sedema wê jî ew bû ku nirxê hemû kel û pelan bûha bû. Herwiha çû û hatina xwendekaran mehane 80`ê hezar. Heyanî ku ji min tê ez bi her kesî re dibin alîkar û bi wijdanî kar dikim."

**'Basa min ji bo xizmeta civakê ye'**

Ezîz Sîno axaftina xwe wiha qedand: "Armanca min ya sereke ji basê ew ku xizmeta civaka xwe bikim. Herwiha astengiyên ku ez û her erbeyek li ser riya van gundan diçin û tên, ew e ku rê qîra wê ji aliyê şaredariyê ve hat rakirin, da ku ji nû ve bê çêkirin lê heya niha jî nehatiye çêkirin, lewra bengewazî û hêviyên me ew ku ev rê bê çêkirin. Astengiya din jî ewbû ku di salên borî de mehane sê bermîl mazot ji bas û erebeyan re derdiket, lê di sala 2023`an de ew mazot li ser me qut kirin, ji bo wê daxwaza min mazotê qut nekin ji ber ew jî weke her erbeyekê ye û ji bo civakê ye."

Sudoku: Bersiv 89

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 2 | 4 | 5 | 6 | 8 | 3 | 7 | 9 | 1 |
| 8 | 7 | 6 | 4 | 1 | 9 | 5 | 3 | 2 |
| 1 | 3 | 9 | 5 | 7 | 2 | 8 | 6 | 4 |
| 9 | 2 | 3 | 1 | 5 | 8 | 6 | 4 | 7 |
| 5 | 6 | 1 | 7 | 9 | 4 | 2 | 8 | 3 |
| 7 | 8 | 4 | 2 | 3 | 6 | 9 | 1 | 5 |
| 4 | 9 | 8 | 3 | 2 | 7 | 1 | 5 | 6 |
| 3 | 5 | 2 | 8 | 6 | 1 | 4 | 7 | 9 |
| 6 | 1 | 7 | 9 | 4 | 5 | 3 | 2 | 8 |

Sudoku:Pirs 90

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | 2 | | 3 | | | | |
| | | 1 | 6 | 2 | | 4 | 5 | |
| 5 | | | | | 8 | | | 7 |
| | 5 | 3 | | 7 | | | | 6 |
| 6 | | | | | | | | 4 |
| 8 | | | | 9 | | 1 | 7 | |
| 2 | | | 9 | | | | | 8 |
| | 6 | 7 | | 1 | 2 | 5 | | |
| | | | | 5 | | 3 | | |

## FERHENGA BIWÊJAN

**Tu dibêjî qey ji devê gur felitiye:**
- Pir tirsiyaye; pizdiyaye; kezebê wî qetiyeye.

**Tu li Soro dixî, Moro ji xwe ditirse:**
- Ditirse ku dora wî jî were.

**Xurî hatin Bexdayê min li virê girt tayê:**
- Dema yek berî ku tiştek biqewime ditirse, wê demê tê gotin. (Xurî navê nexweşiyekê ye)

**Xwîn lê miçiqî:**
- Pir tirsiya.

**Zimanê wî li hev ala/zimanê wî li hev herbilî:**
- Tirsiya.

**Zimanê xwe yê piçûk qurpand/zimanê xwe yê piçûk daqurtand:**
- Pir tirsiya; bizdiya

**Zirav di zikê wî de nîne/bêzirav e:**
- Pir tirsonek e.

**Ziravê wî qetiya/dilê wî qetiya:**
- Pir tirsiya; bizdiya.

**LI SER BERXWEDAN Û XÎRETÊ**

**Biqayîş e:**
- Serê xwe danayne; neheqiyê qebûl nake.

**Bi qûnxişkê mirov ji ber kîran xilas nabe:**
- Bi revê û bi berxwedana piçûk mirov ji xeteran rizgar nabe.

**Dest bir xwe:**
- Li ber xwe da; xwe kêm nekir; dest hilanî; şerê yê li hemberî xwe kir.

**Dest hilanî:**
- Li ber xwe da; bi ser ket; mêranî kir.

**Dest hilda:**
- Bi heman wateyê.

**Lingên xwe dan ber xwe:**
- Dest bir xwe; li ber xwe da; têkoşa.

**Morên wî rabûn:**
- Hat xîretê; gotinan bandor lê kir; tiştên bûyîn bandor lê kirin.

**Natewe/naçeme:**
- Serê xwe danayne; neheqiyê qebûl nake.

**Serê xwe natewîne:**
- Xwe kêm nake.

**Serê xwe danayne:**
- Bi heman wateyê.

**Xîret avêtine ber kûçik, kûçik qebûl nekiriye:**
- Roj roja xîretê ye; kesê rûmet û xîret pê re hebe divê tişta bûyî qebûl neke.

**LI SER BÊXÎRETÎ, BÊRÛMETÎ Û LIBERXWENEDANÊ**

**Av li xwe şêlo nekir:**
- Alîkariya min nekir; tevlî şerê min û wî nebû; dest nebir xwe.

**Av li xwe negerand:**
- Dengê xwe nekir; serê xwe tewand; bêxîretî kir; mêranî jê nehat.

Ji Pirtûka Ferhenga Biwêjan Ya Diyar Bohtî

## Pergala Îmraliyê ...(2)



Piştî qanûnên 1'ê Hezîrana 2005'an, Rêberê Gelê Kurd ê ku ji sala 1999'an û vir ve di hucreya yekkesî ya giravê de tê ragirtin, heta niha bi awayekî kêfî gelek "cezayên yekkesî" lê hatiye birîn.**R-6**

## 'Bi armanca naskirina ramanên Rêber Apo pirtûkên wî tên xwendin'

Endamê Akademiya Rêber Apo Yûsif Kûtê diyar kir ku di çarçoveya berdewamiya pêngava 'Ji Rêber Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî' kampanyaya 'Rojên Xwendina Pirtûkên Abdullah Ocalan' hat destpêkirin û got, " Xwendin û naskirina pirtûkên Rêber Apo naskirina pirsgirêkên mirovahiyê ye."**R-4**

Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1177 | 12-Pûşper-2024 | www.ronahi.net/ku/ | Nirx: 500 L.S



## Tevlîbûna jinan di xebatên rêveberiyê de serkeftineke mezin e

Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê karîbûn di nava Rêveberiya Xweser de rolekê biserkeftî bilîzin her wiha tevlîbûna jinan di sîstema hevserokatiya hevbeş de ku cara yekemîn tê pêşxistin bandoreke pir mezin li tevahî cîhanê kir.**R-2**



## Sûc û kiryarên cendirmeyên artêşa Tirk a dagirker li ser sînorê Sûriyê

Piştî destpêkirina aloziya Sûriyê, Artêşa Tirk a dagirker li dijî penaberên Sûriyê li ser sînor tevahiya cûreyên kiryarên dijmirovî pêk tîne û zagonên parastina mafên penaberan a navneteweyî binpê dike. Li gorî raporan heta niha 562 penaberên Sûrî li ser destê cendirmeyên dewleta Tirk hatine kuştin.**R-5**

# WÊ TU HÊZ NIKARIBE VÎNA GERÎLAYÊN AZADIYÊ BIŞKÎNE

Êrişên dewleta Tirk yên li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê dewam dikin. Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê jî bi taktîkên afirîner êrişên dagirkeriyê  têk dibin. Ji her kesî re eşkere ye ku artêşa Tirk li hemberî berxwedana Gerîla di çi rewşê de ye, li çiyayên Kurdistanê ew bê çare maye, ji ber wê ew bi reklaman hewl dide leşker û teknîka xwe serketî nîşan bide, lê li gel şert û mercên giran jî Gerîlayên Azadiyê  bi çalakiyên xwe teknîk û hêza leşkerî ya dewleta Tirk a dagirker têk dibe û ji tevahiya cîhanê re isbat dike ku tu hêz nikare vîna şervanên azadiyê bişkîne.**R-3**






## Afrînera hunera şoreşgerî; Koma Cûdî

Koma Cûdî, komeke hunerî ya devera Dêrikê ye ku di sala 1986'an de hatiye damezirandin. Endamê komê, Xalid Cûdî têkildarî avavbûn û xebata komê da zanîn ku Koma Cûdî di salên 1980' û 1990'î de tevî zor û zehmetiyan hunera şoreşgerî afrandin û li pêş xistin.**R-7**

Nehîr pale — Binçavkirina mamosteya zimanê Kurdî bi zanebûne R-2


Dilyar Cizîrî — Hilbijartin bêyî sindoqan serkeftin anî! R-4

Zekî Bedran — Di hembêza Tirkiyê de muxalefetî nabe R-5

Farûk Sakik — Karmendên Mêtingeriyê R-5

Kemal Necim — Hemû cureyên wêjeyê dinivîsin yekê jî nabin serî R-7

# Tevlîbûna jinan di xebatên rêveberiyê de serkeftineke mezin e

Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê karîbûn di nava Rêveberiya Xweser de rolekê biserkeftî bilîzin her wiha tevlîbûna jinan di sîstema hevserokatiya hevbeş de ku cara yekemîn tê pêşxistin bandoreke pir mezin li tevahî cîhanê kir.

**Lîloz Hisên/ Qamişlo**

Şoreşa Sûriyeyê bû derfetek ji bo jinên herêmê da ku muhra xwe lêbixe, êdî roleke xurt lîstin di riya avakirina rêxistin û saziyên taybet yên jinan û ji bo pêşxistina projeya Rêvebriya Xweseriya Demokratîk pêşengtî kir û tevlî xebatên saziyên rêveberiyê bûn di tevahî waran de çi leşkerî, siyasî, dîblomasî û aborî.
Hevseroka Desteya Parastinê ya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Beyan Elî diyar kir ku şoreşa ku bi navê jinê hate kirin helbet bi pêşengtiya jinan hate destpê kirin û wiha pêş de çû: “ Bi destpêkirina şoreşa Rojavayê Kurdistanê re tevahî jinên herêmê karîbûn gelek pêşketinan di xwe de bidin çêkirin em ji bîr nekin pêşengtiya YPJ di şerê li dijî rêxsitina DAIŞ ya terorist de ku îro



bandoreke pir mezin li ser hemû jinan û netewan kiriye.
Beyan Elî wiha domand: “ Projeya Rêvebriya Xweser ya Netewa Dmeokratîk li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê rê li ber jinan vekir da ku ew jî tevlî vê projeyê bibin û rola xwe bilîzin di pêşketina vê sîstema demokratîk de”.
Beyan Elî got:” Îro jin di nava saziyên Rêveberiya Xweseriya Demokratîk de cihê xwe girtiye û bi serkeftin kar û xebatên xwe dimeşîne her wiha li gel mêr hevserokatiya hevbeş ku cara yekemîn hatiye pêşxistin bandora xwe li tevahî cîhanê kir. Ev ne tenê gotineke ku em tînin ser ziman lê tişta ku hatiye jiyan kirin di hundirê pratîka 12 salan de ji destpêka şoreşê heta niha tê jiya kirin”.
Beyan Elî destnîşan kir ku ew pir moral digrin dema jinan dibînin di nava rêvebriyê de ku gihaştiye asteke mezin li ser asta cîhanê û nûnetiya rêvebriyê li derve dikin û wiha got: “ Îro berxwedanî û keda jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê ji bo hemû cîhanê bû nimûne û cihê ku mirov wê pîroz dibîne”.
Beyan Elî got:” Jinê rola pêşengtiya şoreşa Rojavayê Kurdistanê kir û tevlî tevahî warên jiyanê bû çi di warê Dîblomasî, leşkerî, siyasî û aborî her wiha pêşengtiya civakê û sîstema Netewa demokratîk kir vê yekê bandor li ser kesayeta jinê çêkir da ku gavên mezintir bavêje ber bi pêşerojê ve”.
Beyan Elî got: “Jinên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê bûn mînakeke ji bo tevahî cîhanê û bi taybet jina kurd karîbû bandorê li ser tevahiya jinên pêkhateyên herêmê bike ji ereb, ermen, tirkmen û suryanî, em vê tevlîbûna mîna serkeftineke mezin dinirxînin”.
Beyan Elî di dawiya gotinên xwe de got:” Sîstema Rêvebriya Xweser hişt ku jin li her cihê ku kar û xebat lê tê meşandin li wê qadê bibe xwedî îrade û hebûn. Her wiha jin bûye cihê biryar, nêrînê, armanca me ya yekemîn û serek parastina hemû jinan, nirx û destkeftiyên şoreşê yên bi saya bi hezaran şehîdan pêk hatiye û divê îro jinên vê herêmê bi giştî xwedî lê derbikevin.

# Rola mamosteyên jin di pêşxistina civakê de sereke ye

**Jîn Hisên/ Qamişlo**

Hevseroka Desteya Perwerde û Fêrkirinê ya kantona Cizîrî Gulîstan Ismayîl da zanîn ku tevlîbûna jinê de qada perwerdeyê de zihniyeta paşverû guhert û wekheviya di navbera her du zayendan pêş xist. Tevlîbûna jinê di qada perwerdeyê de ji destpêka şoreşa 19`ê Tîrmehê ve li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê nimûneyek erênî li gel civakê çêkir, herwiha rola wê ya mezin di pêşketina civakê de îsbat kir.
Derbarê rola jinê di nava qada perwerdeyê de hevseroka Deseteya Perwerde û Fêrkirinê ya kantona Cizîrî Gulîstan Ismayîl ji rojnameya me re aixvî.
Gulîstan Ismayîl di destpêka axaftinên xwe de bal kişand ser tevlîbûna jinê di qada perwerdeyê de û wiha got: “Jinên Herêma Bakur û Rojilatê Sûriyeyê bi taybet jinên kurd piştî destpêkirina kirîza Sûriyê derfet dît da ku xwedî li zimanê kurdî derkeve, êdî tevlî qada perweredeyê bû ji bo zimanê kurdî di nava civakê de belav bike, êdî derbasî dibistanên rêjîmê bû, di nava sîstema desthilatdar karîbû zimanê dayikê bixe dibistanan de û roleke sereke lîst ji bo perwerdekirina zarok û civakê.”
Gulîstan Ismayîl diyar kir ku jinên Herêma Bakur û Rojhialtê Sûriyeyê bi tevlîbûna qada perwerdeyê de gaveke mezin avêtin û wiha domand: “Mamosteyên jin karîbûn gaveke mezin bavêjin û bi israr tevlî qada perwerdeyê bûn, bi armanca perwerdekirina civakê di warê zanistî de, mamosteya jin roleke wê ya sereke heye di diyarkirina karaktera hawîrdora perwerdeyê de, herwiha di peydakirina hawîrdoreke erênî û xwendekaran taşwîq bike di domandina riya xwendinê, ji ber ku hestên dayikbûnê bi têkiliyên xwe re li gel xwendekaran bi kar tîne.”
Gulîstan Ismayîl wiha berdewam kir: “Tevî hemû zehemetiyên ku li pêşiya mamosteyên jin derketin, lê têkoşîn û berxwedaneke mezin hate meşandin li hemberî êrîşên zihniyetê û fikrên paşverû, mamosteyên jin bandoreke pir mezin li ser civakê kir, em ê bên dema ku metryalên xwendinê bûn yê Rêvebriya Xweser bi pêşengtiya jina kurd karîbû bandorê li tevahiya pêhkateyên li herêmê jî bike, bi pêşengtiya jina kurd û bi taybet mamoste bandora xwe li ser pêkhateyên din jî kir, êdî jinên ereb û pêkhateyên dîtir yên ku li Rojavayê Kurdistanê jiyan dikin tevlî karê mamostetiyê bûn, civak gihaşt qûnaxekê ku di kesayeta mamosteya jin mînakekê bibîne, piştî rêbazê perwerdeyê bi tevahî hate guhertin êdî ev bû destkeftiyeke mezin û hejmara mamosteyên jin her ku diçû zêdetir dibû.”
Gulîstan Ismayîl wiha pê de çû: “Di sîstema perwerdê de ya Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê de komîte û kordînasyonên jinan hene, da ku çi pirsgirêk an astengî li pêşiya mamosteyan derkeve di qada perwedeyê de, bibin alîkar bi hev re da ku wan pirsgirêkan derbas bikin.
Gulîstan Ismayîl lê zêde kir: “Mamosteyên jin barên wan pir giran e, ji ber ku ew weke dayikeke xwedî malbat û zarok karê xwe dimeşîne û di heman demê de jî mamosteyeke barê fêrkirin û perwerdeya xwendekaran dikeve ser milê wê, di vir de zehmetî li pêşiya wê derdikeve, lê heta astekê ev mamoste kare hevsengiyê bixe nava van her du karan de, da ku qelsî dernekeve.”
Gulîstan Ismayîl bal kişand ser bandora jinê ser zarokan: “Mamosteya jin bandoreke erênî li ser zarokan dike, ji ber di eynî demê de mamoste dayikeke, hestên dayikbûnê di vî karî de jî dimeşîne, zane çawa têkiliyan bi zarokan re çêbike, ev yek dihêle ku rehetiyekê li cem zarok û xwendevanan çêbike, ev yek di xwezaya wê de heye lewma xwe berpirsyar dibîne di pileya yekemîn de.
Gulîstan Ismayîl bal kişand ser sîstema hevserokatiyê di nava tevahî warên jiyanê de bi taybet



di warê perwerdeyê de û wiha got: Sîstema hevserokatiyê gelek guhertinê di nava civakê de pêk anî, hişmendiya şaş herwiha nêzîkatiya civakê li hember jinê hate guhertin, lewma divê jin di nava xwe de kesayetek xurt bide avakirin.”
Gulîstan Ismayîl da zanîn ku mamosteyên jin li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê gihaştine wê astê ku ew beşeke mezin ji pêşketina civakê ne û wiha domand: “ Der barê tecrûbeya jinê ya di nava civakê de mamoste bi gihandina nirx û exlaqên erênî di avakirina kesayeta xwendekaran de dibe alîkar.”
Gulîstan Ismayîl di dawiya axaftina xwe de da zanîn ku bi hebûna jinan di qada xwendinê de hevsengiya zayendî di hawîrdora perwerdeyê de pêk tê û wiha qedand: “Ev yek dibe alîkar ku xwendekar girîngiya wekhevî û hevkariya di navbera zayendan de di civakê de fam bikin, bi pêşkêşkirina modelek erênî û piştgirî, jin beşdarî avakirina civakek perwerdehiyê ya li ser bingeha jêhatî û hevkariyê dibe.”

## Ji Pênûsa Jin

### Binçavkirina mamosteya zimanê Kurdî bi zanebûne

**Nehîr Pale**

Sîstem bi gelek rêbazên dûrî exlaq û qanûn êrîşî jinan dike. Her rêbazekî wan ê işkencekirinê bi cureyekî ye lê hedef yek e. Bi işkencekirina fîzîkî û derûnî dixwazin ruhê jinê pûç bikin, biwestînin, îradeya wê bişkînin û di hemû rewşan de îhanetê lê bikin.
Li Îranê jinên Kurd ên têkoşînvan têne kuştin û ceza kirin. Jîna Emînî û gelek jinên ku li hemberî sîstemê bûn xwedî helwest , hatin girtin û kuştin. Niha bi sedan jin ên karker, siyasetmedar û rewşenbîr di girtîgehên Îranê de ne. Êdî mamosteyên jin ên zimanê Kurdî jî têne binçavkirin û ceza kirin.
Roja 15`ê Gulana 2024`an mamosteya zimanê Kurdî Sewsen Mihemed Zade ji aliyê hêzên Îranê ve li cadeyeke bajarê Bokan ê Rojilatê Kurdistanê bi lêdanê hatiye binçavkirin. Heyanî niha parêzer û malbata wê nikarin agahî jê bigrin.
Sewsen Mihemed Zade ev bûye 17 sale li bajarê Bokanê yê Rojhilatê Kurdistanê û gundewarên wê mamosteya zimanê Kurdî ye. Gelek caran hêzên ewlekariyê bang lê kirine û gef lê xwarine ku ew ê were lêpirsîn kirin. Ev bûye 25 roj e mamosteya zimanê Kurdî binçavkirî ye û agahî jê nayê girtin. Sîstema Îranê bi van rêbazan dixwaze çavên malbat û civaka Kurd bitirsîne.
Dewleta Îranê ev ne cara yekeme ku mamosteyên zimanê Kurdî ceza dike. Jin û Mêr ji ber zimanê dayîka xwe diparêzin û fêrî zarokan dikin hatine girtin û di bin navê li hemberî dewleta Îranê derketine, hatine darve kirin. Rêbazên Îranê yên qedexekirina zimanê Kurdî dide îfade kirin ku ew naxwazin civaka Kurd fêrî zimanê xwe yê dayîkê bibe û biyaniyê zimanê xwe be.
Rêber APO di parêznameya Parastina Kurdên di nava pencê qirkirina çandî de ji bo ziman dibêje `Ziman danheva zîhniyet, exlaq, hîs û fikra estetîk e ku civakê bi dest xistiye. Civaka xwe gihandibe ziman, bûye xwediyê sedema bi hêz a jiyanê`. Rêber APO pêşketina civakan bi pêşketina zimanê wan ê dayîkê ve dide girêdan. Civaka ku zimanê xwe wenda kiribe wê asîmîle, nexweş û mehkûmî jiyaneke trejîk bimîne.
Li Rojhilatê Kurdistanê jina Kurd ji bo fêrbuyîn û vejînkirina zimanê Kurdî têdikoşe. Îran vê yekê qebûlnake û bi girtina mamosteyên Jin ên zimanê Kurdî dixwaze dawî li çanda gelê Kurd bîne.
Fêrkirina zimanê dayîkê aliyê zagon û exlaq ve ne qedexe ye û ne jî sûc e. Lê Îran wê mamoste Sewsen bi xîyanetê sûcdar bike da ku bikaribe hebûna wê bi dawî bike. Her Kurdek fêrî zimanê xwe bibe dikare xwe ji asîmle û qirkirinê rizgar bike, hebûna xwe îfade bike û çanda xwe vejîn bike. Ev yek li ser dewletên netewperest xeterî ye, ji ber vê yekê mamosteyên zimanê Kurdî digrin û hewl didin wan ji holê rakin.
Îran, Tirkiyê û hemû dewletên netewperest ji aliyê îdeolojîk ve jinê li ser xwe xeter dibînin. Bi taybet fêrkirina zimanê Kurdî wê ne tenê qedexe bikin, wê hewl bidin ji kokê ve dawî lê bînin. Mamosteyên zimanê Kurdî wê her tim hedef bigrin. Destûr nedin ku mamoste xebatên ziman birêve bibin û êrîşî wan bikin.



# Afrînera hunera şoreşgerî: Koma Cûdî

Koma Cûdî, komeke hunerî ya devera Dêrikê ye ku di sala 1986’an de hatiye damezirandin. Endamê komê, Xalid Cûdî têkildarî avavbûn û xebata komê da zanîn ku Koma Cûdî di salên 1980’ û 1990’î de tevî zor û zehmetiyan hunera şoreşgerî afrandin û li pêş xistin. Her wiha îro li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê xebata hunerî dide meşandin.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Koma Cûdî yek ji komên hunerî yên Rojava ye ku di asta herî jor de mijûlî stranbêjî û mûzîkê dibe. Hêjayî gotinê ye ku di sala 1986’an de hatiye avakirin û ji wê demê ve li Rojava xebata hunerî, berhemên şoreşgerî û çanda kurdî hatiye kirin.
Her wiha têkildarî avabûn û xebata hunerî ya Koma Cûdî, endamê wê Xalid Cûdî ji rojnameya me re axivî.




**Avabûna Koma Cûdî**

Xalid Cûdî di derbarê avabûna Koma Cûdî de wiha got: “Ji sala 1984’an heya 1986’an û bi şûn de piraniya komên hunerî yên Rojavayê Kurdistanê hatine avakirin. Weke Koma Botan, a Qamişlo, Koma Agirî, Serhildan û hwd… Ev kom bi giştî di wan salan de hatine avakirin ku weke berhemên Rêber Apo û şehîdên azadiyê ne. Koma Cûdî jî weke wan komên din yên Rojava bû ku di 1984’an de komî ser hev bûye û di 1986’an de hatiye avakirin. Avabûna wê her wiha kar û xebata vê komê di wê demê de bi rengekî zehmet bû. Wekî em dizanin di wê demê de zext û astengî ji aliyê Rêjîma Beeis hebû. Tevlîbûna endaman, mînak stranbêj û mûzîkjena ji komê re jî zehmet bû. Avabûna wê li ser destê Şehîd Dijwar Dêrik bû, ew damezrînerê Koma Cûdî bû, wî ev kom ava kir û piştî xebateke hunerî a bi nirx û di nava şoreşa tevgera azadiyê de şehîd ket. Koma Cûdî bi taybet a devera Dêrikê ye, navê xwe jî ji çiyayê Cûdî wergirtiye. Koma Cûdî hêza xwe ji fikr û felsefeya Rêber Apo û vîna şehîdan digire.”

**Kar û xebat**

Xalid têkildarî kar û xebata Koma Cûdî wiha anî ser ziman: “Koma Cûdî weke beşek ji Navenda Çand û Hunerê ya Dêrikê ye. Ew komeke hunerî taybet a mûzîk û stranan e, hejmara endamên wê 11 kes in. Koma Cûdî li ser asta Bakur û Rojhilatê Sûriyê xebata hunerî dide meşandin. Di salên 1980’î û 1990’î de koma Cûdî weke komeke şoreşgerî xebateke hunerî ji çanda şoreşê li pêş xist. Di wê demê de stranên girêdayî şoreşê, şehîdan û Rêber Apo û xwezaya Kurdistanê 10 kasêt tomar kir. Piştî Şoreşa Rojava, dîsa jî Koma Cûdî li ser şehîdan, YPJ û YPG’ê û di hemû war û pêngavên şoreşê de mîna pêngavên şer yên li dijî DAIŞ’ê, hikumeta Şamê û berxwedaniya li dijî dewleta Tirk a dagirker bi 10’an stran gotine. Her wiha gelek şahiyên civakî û festîvalên hunerî jî lidarxistine. Hêjayî bi bîrxistinê ye ku sala bûrî Koma Cûdî di Festîvala Orkêş ya Mûzîkê de asta yekem derket. Koma Cûdî di warê xebata hunerî de jî berdewam e. Li aliyekî din jî bi awayekî rojane endamên komê perwerdeyên mûzîk û stranbêjiyê dibin. Her wiha bi rengekî heftane û mehane jî endamên me tevlî perwerdeyên bîrdozî dibin. ”

**Berhema evdîşo û berhemeke din di dema pêş de**

Endamê Koma Cûdî, Xalid Cûdî di derbarê berhemên komê de wiha axivî: “Di dema dawiyê de me weke Koma Cûdî berhemek bi navê Evdîşo çêkir. Evdîşo xwedî çîrokeke, Evdîşo qehremanekî aşûrî ye. Çîroka Evdîşo li Geliyê Tiyarê yê girêdayî Colemêrgê ya Bakurê Kurdistanê ye. Çîroka Evdîşo vedigere serdema dewleta osmaniyî da ku di wê demê de şerekî di navbera eşîreyên kurd û xiristiyanan de biafrîne, hin kurdên sîxur bi kar tîne. Dewleta osmanî bi riya hin kurdên sîxur êrişî eşîreyên Tiyarê kirin û xwestin wan talan bikin. Di wê demê de jî Evdîşo berxwedaniyeke mezin kiriye, dengbêjên kurd yên wê demê qehermaniya Evdîşo jî anîne ziman. Me jî xwest weke Koma Cûdî xwestiye kilîbekê li ser qeheremaniya Evdîşo çêbikin. Her wiha xwestiye bi rengekî cuda ku li ser bingehê netewa demokratîk ku hemû ol û bawerî û pêkhate cihê xwe di nav vê berhemê de bigirin û vê kilîpê çêbikin. Di dema pêş de xebata hunerî ya ku wê were kirin ew e ku wê berhemeke nû têkildarî destana Îzidxanê, berxwedaniya Şengalê û xwezaya wê, were çêkirin. ”

# Ez zaroka Efrîn’ê me


Navê min; sêvîn
Navê min; şêrîn
Navê min; evîn
Paşnavê min;Efrîn’a kurda
Dayîka min xecê, kefen li ser mil, dara zêtûnê av dide.
Bavê min sîyabend, ji derda, rih û simbêl berda.
Bi tûtina bêrîkirna gund û kaxaza hesrtê cixareyan dipêçe.
Xwişk û birayên min bi lîstikên xwe, serî rakirine li ber zehmetiya.
Dapîra min, piştî ku bi teşiyê zemanê xwe rêsan,
rûnişt û bêçare li dûmanê ji rêçika wê rabûbû, dinêrî.
Li ser rûyê min ken,
Di çavên min de êş û jan,
Li ser bedena min şopên şer,
Di hinava min de volkanên tolhildanê diteqin,
Erê !
Îro pêxas, lêv terikî, por hinç, çavhêsir
û di kolanên çadirên şahbayê de bêkes im!
Lê, di dilê min de hêvîya xwe direjkirina li bin dara zêtûnên gund,
Û bi mistan vexwarina ava kanlyê hildavêje
Ma hûn tîrêjên roj’ê yên li ser eniya min,
Û
Xwîna pakrewanan ya li ser milên min, nabînin,
Olana govenda serkeftinê nabihîs in !
Ma ez ê hestîyên kal û pîrên xwe bi ku ve bibim
Ez ê çawa bîranîn ku min di wan şivsrêyan de çandî sêwî bihêlim û ez ê li ku,
Kêfxwaşîya xew a li ser baniyan di şevên havînê de ,
û şadimaniya ku min ji vegotina çêrokên pîrê digirt, tehm bikim!..
ji bîr mekin ku,
Pismam û dotmamên min meqebên xwe qetandine li serê çîya!
Ap û xaltîya min xwîna xwe rijandine.
Hêj çend salîbûm, min xwedayê bavan kuşt



û xwedayê xwe bi xwe afirand!
bo xatirê efrîn’ê,ez ê wî jî bikujim!
Min,
Ji çîya yê Lêlûn, Hawarê û ji çîya yê Hesîxidir bipirsin!
ji Hûrîyan û Med’an ve li virim
û ez ê her li vir; li Efrîn’ê bijîm!..
ey “mezinên” ku zarokên xwe revandine ewropa!
zarokên we ji têran dimirin,
ez bi êşa birçîbûnê dipijim, dikemilim û xurt dibim,
ma bêhna axa Efrîn’ê û ava wê çi nagihîne?
ka bêjin,çi negihandî?
ma lehengên mîna Şêxmûs, Seyfî, Zekerlya, Xweşnav û Rêna’san negihand,
ma Silava, Fîdan, Arîn û Aveste’yan ne gulên di vê axê de pişkivînbûn!
Bêyî wan gulan nikarim bijîm,
Bi wan ez heme
Bi wan ez bûm ez,
û
Navê min bû; Têkoşîn
Navê min bû; Şervîn
Navê min car bû; Evîn
Paşnavê min; Efrîn; bûka Kurdistan’ê !..

**(Li kampa Berxwedanê, Şehba)**

## Têbînî



### Hemû cureyên wêjeyê dinivîsin yekê jî nabin serî

**Kemal Necim**

Tê zanîn ku çend cureyên dahênana wêjeyî hene, mîna helbest, çîrok, roman û şaxên ku ji wan cureyan jî dirêj û belav dibin weke şêweyên çîrokê yan şêweyên helbestê. Li gorî wê her wêjevanek bi cureyeke wêjeyê ve mijûl dibe û derbirîna xwe, hest, bîr û baweriyên xwe di wê cureya wêjeyê de diafirîne. Nasnameya wêjeyî ya dahêneran jî li gorî cureyê wêjeyê yê ku pê mijûl dibe tê çesipandin û weke hebestvan an çîroknivîs yan romannivîs tê nasîn.
Lê carna hin dahêner xwe ji cureyeke wêjeyê davêjin cureyeke din, hin jî di heman demê de pir cureyên wêjeyê dinivîsin, mrivo dibîne ku hem helbestê dinivîse hem çîrokê hem jî romanê. Ev diyarde ne di civaka dahênerên kurd tenê de tê dîtin lê heme bêje di hemû civakên cîhanê de rû dide.
Der barê mijarê de nêrînên cuda û dijber hene. Ji xwe tê zanîn ku ti zagon yan rêgez tune ku rê li pêşiya dahêneran bigire ku pir cureyan binivîse, her wiha hin mînak jî hene ku hin dahêneran karîne di cureyên cuda de afrêneriyê bikin, lê ew mînakên pir kêm in, her wiha wan kesan berî ku cureyeke din binivîsin di cureyê pêşî de afrênerî kirine û berhemên bi hêz danîne.
Li gorî hin wêjevanan mirovê ku pir cureyên wêjeyê dinivîse, zehmet e ku karibe xwestekên xwe, yan azweriyên xwe lihev bîne, û bi awayekî baş mafê her cureykê bidiyê, her wiha dibêjin dema ku em bibînin kesek ku helbest û romanê dinivîse û karê nîgariyê dike, di heman demê de di rexneyê de an mijarên din de dinivîse, ew kes dixwaze pir tiştan bêje û gelek ramanan pêşkêş bike, lê ew bêyî ku zanibe ramanên xwe belav dike û demên xwe bi gelek cureyên dahênan derbas dike û winda dike, li şûna ku hemû hêza xwe bide cureyekî wêjeyî yan hunerê ku karibe peyama xwe bi tevahî ragihîne.
Her wiha li gorî wan nivîskar û lêkolîneran, pir kesên ku ji cureyekê wêjeyê diçin yekê din, yan jî di gelek cureyan de dinvîsin, ketine pey hewildana belavkirina navê xwe yan li pey xelat û pêşbirkan ketine lê hayê wan jê namîne ku ew nasnameya xwe ya wêjeyî winda dikin û li aliyekî din jî dîmena wan li ber çavê xwêneran şêlo dibe êdî xwêner nizane ka ew helbestvan e lê çîroknivîs yan romanivîs e.
Rewşeke wiha ya windabûna nasnameyê li qada û civaka wêjeyî ya Rojavayê Kurdistanê jî rû dide. Van rojan li Qamişlo Nehemîn Mihrîcana Kurteçîroka Kurdî tê lidarxistin, hijmareke mezin ya danerên çîrokê beşdar bûne. Lê li gorî bernameya mihrîcanê û navên ku başdar bûne, heme bêje piraniya kesên ku bi çîrokên xwe beşdar bûne berê weke helbestvan yan nivîskarên şanoyê dihatin naskirin û hinek ji wan jî berê beşdarî pêşbirkên helbestê bûne. Mirov nikare bêje ku ev rûdan ji qedir û rêza wan daneran kêm dike, lê pirsek tê bîra mirov ka gelo wan nivîskaran karîn di nivîsîn û danîna helbestan ya şanoyan ya romanan de afrêneriyeke baş bikin û jê têr bibin ta ku berê xwe bidin cureyeke din. Ango wan daneran ezmûna têgihiştî û pijiyayî ya helbestê derbas kirin berî ku berê xwe bidin çîrokê. Yan tenê ketine pey hewildana belavkirina navê xwe yan li pey xelat û pêşbirkan.

# Pergala Îmraliyê ...(2)

**Amara Baran/ Qamişlo**



Piştî qanûnên 1'ê Hezîrana 2005'an, Rêberê Gelê Kurd ê ku ji sala 1999'an û vir ve di hucreya yekkesî ya giravê de tê ragirtin, heta niha bi awayekî kêfî gelek "cezayên yekkesî" hatiye birîn. Sedemên hucreya yekkesî li ser fikir û biryarên wî yên di derbarê qirkirina çandî, mafê perwerdeya bi zimanê dayikê, xweparastin, agirbest, aştî û çareseriya demokratîk, rewşa siyasî ya heyî û geşedanên muhtemel de bû.
Di van cezayan de hevdîtina li ser Rêberê Gelê Kurd bi malbata xwe re hate qedexekirin, radyo, pirtûk, rojname û kovarên wî hatin girtin; Bi kurtasî, ew rastî pêkanînên ku bi dîwarên tazî tenê tê hiştin, ku jê re "îşkenceya spî" tê gotin, hat kirin. Parêzerên di pêvajoya lêpirsînê ya van cezayan de cih negirtin û bêyî ku agahî bidin wan li derveyî pêvajoyê hatin hiştin.
Rêberê Gelê Kurd di pêvajoya tecrîdê de rastî muameleya xerab hat. Nameyên asayî yên ku jê re dihatin şandin ne dihatin dayîn an jî dihatin sansûrkirin û tenê çend gotin dihatin gotin, ji aliyê din ve nameyên tijî heqaret û tehdîdên giran dihatin dayîn, tevî ku rêveberî ne xwedî rayeya qanûnî bû. Bi şev û roj vebûn û girtina sîstematîk a pencere , bi darê zorê qutkirina porê wî bû.

**Rapora CPT hevkariya bi dewleta Tirk re dide nîşandan**

CPT dema ku dem bi dem diçû girava Îmraliyê û kontrol dikir, gelek caran raporên xwe yên der barê Îmraliyê de eşkere kir. CPT'ê di Îlona 2001'an de rapora ku di Nîsana 2002'an de bi destûra dewleta Tirk a wê demê li gelek girtîgeh, çaksazî û qereqolan, di nav de girtîgeha Îmraliyê, ziyaret kir, ji raya giştî re eşkere kir. CPT'ê di raporê de diyar kir ku Abdullah Ocalan"nikare heta hetayê di nava tecrîdeke awarte de bê hiştin" û ji dewleta Tirk xwest ku van şert û mercan biguherîne û hawîrdorek ku bi girtiyên din re li cem hev be ava bike.
CPT ku di navbera 16-17'ê Sibata 2003'an de çû Îmraliyê û di sala 2004'an de rapora xwe eşkere kir, di rapora xwe de pêşniyarên ji bo astengkirina hevdîtinên bi parêzer û malbata Abdullah Ocalan re ji ber hincetên hêsan cih girt. Di raporê de hat ragihandin ku bi awayekî defakto sekinandina mafên hevdîtinê ji bo girtiyan rewşeke giran e û nayê qebûlkirin, hat xwestin ku ev rewş ji bo birina xizm û parêzerên Abdullah Ocalan ji bo Girava Îmraliyê bê bikaranîn. ger ew keştî ne amade be jî daxwaza wesayîta nobedariya peravê bikar bînin kir.
CPT'ê di rapora xwe ya 5'ê Tebaxa 2020'an de ev rewş weke bêhiqûqiya mutleq pênase kir, diyar kir ku li dijî hiqûq û pîvanên navneteweyî nayê qebûlkirin û pêşniyara rakirina wê kir. Her wiha hat dîtin ku cezayên dîsîplînê yên ku ji bo pêşîgirtina li hevdîtinên malbatê wek hincet tên bikaranîn ne pêbawer û xapandine. Berê jî diyar kiribû ku ji 27'ê Tîrmeha 2011'an û vir ve ne hevdîtinên bi parêzeran re ji bilî 5 hevdîtinên awarte, biryar û pratîkeke li dijî hiqûqa navneteweyî û hiqûqa navxweyî ye. Li hemberê van biryara CPT bêdeng dmîne ev jî dide dîyarkirin bi dewleta tirk re hevkare ku deqt li Dewleta Tirk nake.

**Sedemin qedexekirina hevdîtinê wihane**

Di sala 2012'an de 104 serlêdan hatin kirin, ji ber keştî xera bû 73 serlêdan, ji ber şert û mercên nebaş ên hewayê 14 serlêdan, ji ber keştî tê tamîrkirin 16 serlêdan û ji ber betlaneya fermî 1 serlêdan hatin qedexekirin
Di sala 2013'an de 102 serlêdan hatin kirin, 82 serlêdan ji ber ku keştî şikestibûn hatin qedexekirin, 9 serlêdan di tamîrê de ne û 4 serlêdan jî ji ber ku betlaneya fermî hatin îlankirin hatin qedexekirin
Di sala 2014'an de 104 serlêdan hatin kirin, 86 serlêdan ji ber zirara keştiyê hatin qedexekirin, 9 serlêdan ji ber tamîrkirina keştiyê û 6 serlêdan jî ji ber betlaneyê hatin qedexekirin

Di sala 2015'an de 100 serlêdan hatin kirin, ji ber rewşa hewayê 24 serlêdan hatin qedexekirin, ji ber nebaşbûna keştî 20 serlêdan, ji ber keştî şikestî 37 serlêdan û ji ber keştî di tamîrê de bû 20 serlêdan jî hatin qedexekirin
Di sala 2016'an de 126 serlêdan, 66 ji wan di 15'ê Tîrmehê û 28'ê Kanûna 2016'an de hatin kirin. 2 serîlêdan bi gotina "Dema şert pêk hatin dê destûr bê dayîn" hatin qedexekirin, 1 serlêdan jî bi gotina "dozgeriyê daxwazname neşandiye girtîgehê", 64 serlêdan bi biryara dadgehê hatin qedexekirin, 46 serlêdan jî hatin qedexekirin. bi gotina keştî şikestiye, 7 sepan bi gotina hewaya xirab, 2 sepan jî bi gotina keştî xerabe ye hatin qedexekirin. Ji 2 serlêdanan re tu bersiv nehat dayîn
Piştî sala 2017'an bersiveke erênî û neyînî ji tu serlêdanê re nehat dayîn. Ji sala 2017'an heta Hezîrana 2023'an 717 serlêdan hatin kirin. Di derbarê hevdîtinên malbatê de jî piştî sala 2014'an qedexe li ser hevdîtinên malbatê dest pê kir. Li gorî daneyên parêzerên Buroya Hiqûqê ya Asrinê, heta sala 2014'an ji 277 serlêdanên hevdîtinê yên malbatê tenê 152, serlêdana hevdîtinê ya malbatê jî destûr nehat dayîn
Ji 736 serlêdanên hevdîtina malbatê 575 serlêdan hatin redkirin
Nêrînên malbatê: Di navbera 1999 û 2014 de, 119 ji 277 serlêdanên hevpeyivînê hatine red kirin. Di serlêdanên hevdîtina malbatê yên piştî sala 2014'an de ji bilî 3 destûra hevdîtinê û 1 destûra telefonê tu destûr nehat dayîn. Di vê pêvajoyê de ji 459 serlêdanan tenê 3 destûr hat dayîn. Bi piranî biryara dadgehê wekî hincet serlêdanên ku destûr nehat dayîn hat nîşandan

Têlefona dawîn: 25'ê Adarê, 2021

Hevdîtina herî dawî ya rû bi rû bi birayê Rêber Abdulllah Ocelan di 3ê Adara 2020'an de bû. Ji roja yekem ve, tenê du caran karîbû bi têlefonê (27ê Avrêl 2020 û 25ê Adar 2021) hevdîtin pêk bîne. Peywendiya telefonê ya dawî ya 25ê Adara 2021ê di demeke pir kin de hat qutkirin. Ji wê rojê û vir ve tu xeber jê derneketiye.

**Sal bi sal serlêdanê malbat û parêzeran**

* Di sala 1999'an de 62 hevpeyvîn hatin kirin.
* Di sala 2000'î de 54 serlêdan hatin kirin û 34 hevdîtin destûr hat dayîn.
* Di sala 2001'an de 52 serlêdan hatin kirin û 32 hevdîtin destûr hat dayîn.
* Di sala 2002'an de 52 serlêdan hatin kirin û 32 hevdîtin destûr hat dayîn.
* Di sala 2003'an de 55 serlêdan hatin kirin û 20 hevdîtin destûr hat dayîn.
* Di sala 2004'an de 53 serlêdan hatin kirin û destûr ji 23'an re hat dayîn.
* Di sala 2005'an de 51 serlêdan hatin kirin û 16 hevdîtin destûr hat dayîn.
* Di sala 2006'an de 60 serlêdan hatin kirin û 24 hevdîtin destûr hat dayîn.
* Di sala 2007'an de 60 serlêdan hatin kirin û destûr ji 30 kesan re hat dayîn.
* Di sala 2008'an de 56 serlêdan hatin kirin û destûr ji 38 kesan re hat dayîn.
* Di sala 2009'an de 61 serlêdan hatin kirin û destûr ji 50 kesan re hat dayîn.
* Di sala 2010'an de 65 serlêdan hatin kirin û destûr ji 43 kesan re hat dayîn.
* Di sala 2011'an de 84 serlêdan hatin kirin û destûr ji 24'an re hat dayîn.

Qedexeyên li ser ramanên parêzeran ên der barê Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan de ku qismî hatin sepandin, piştî sala 2011'an jî zêde bûn. Di vê pêvajoyê de 324 caran ji ber keştî şikandine, 45 caran ji ber rewşa xirab, 54 caran ji ber ku keştî di tamîrê de ye, 11 caran ji ber ku betlaneya fermî ye, 22 caran ji ber ku keştî xera bûye, 1253 serlêdanên hevdîtinê nehatine qebûlkirin.

**Sal bi sal sedemên qedexekirinê wiha ne:**

* Di sala 2012'an de 104 serlêdan hatin kirin, ji ber keştî xera bû 73 serlêdan, ji ber şert û mercên nebaş ên hewayê 14 serlêdan, ji ber keştî tê tamîrkirin 16 serlêdan û ji ber betlaneya fermî 1 serlêdan hatin qedexekirin.
* Di sala 2013'an de 102 serlêdan hatin kirin, 82 serlêdan ji ber ku keştî şikestibûn hatin qedexekirin, 9 serlêdan jî keştî di tamîrê de ye û 4 serlêdan jî ji ber ku betlaneya fermî hatin îlankirin hatin qedexekirin.
* Di sala 2014'an de 104 serlêdan hatin kirin, 86 serlêdan ji ber zirara keştiyê hatin qedexekirin, 9 serlêdan ji ber tamîrkirina keştiyê û 6 serlêdan jî ji ber betlaneyê hatin qedexekirin.
* Di sala 2015'an de 100 serlêdan hatin kirin, ji ber rewşa hewayê 24 serlêdan hatin qedexekirin, ji ber nebaşbûna keştî 20 serlêdan, ji ber keştî şikestî 37 serlêdan û ji ber keştî di tamîrê de bû 20 serlêdan jî hatin qedexekirin.
* Di sala 2016'an de 126 serlêdan, 66 ji wan di 15'ê Tîrmehê û 28'ê Kanûna 2016'an de hatin kirin. 2 serîlêdan bi gotina "Dema şert pêk hatin dê destûr bê dayîn" hatin qedexekirin, 1 serlêdan jî bi gotina "dozgeriyê daxwazname neşandiye girtîgehê", 64 serlêdan bi biryara dadgehê hatin qedexekirin, 46 serlêdan jî hatin qedexekirin. bi gotina keştî şikestiye, 7 serlêdan bi gotina hewaya xirab, 2 serlêdan jî bi gotina keştî xerabe ye hatin qedexekirin. Ji 2 serlêdanan re tu bersiv nehat dayîn.
* Piştî sala 2017'an bersiveke erênî û neyînî ji tu serlêdanê re nehat dayîn. Ji sala 2017'an heta Hezîrana 2023'an 717 serlêdan hatin kirin. Di derbarê hevdîtinên malbatê de jî piştî sala 2014'an qedexe li ser hevdîtinên malbatê dest pê kir. Li gorî daneyên parêzerên Buroya Hiqûqê ya Asrinê, heta sala 2014'an ji 277 serlêdanên hevdîtinê yên malbatê tenê 152, serlêdana hevdîtinê ya malbatê jî destûr nehat dayîn.

**Serlêdanê Malbetê**

* Di sala 1999'an de 12 serlêdan û 12 hevdîtin hatin kirin.
* Di sala 2000 de 11 serlêdan û 11 hevdîtin hatin kirin.
* Di sala 2001'an de 6 serlêdan û 4 hevdîtin hatin kirin.
* Di sala 2002'an de 9 serlêdan û 9 hevdîtin hatin kirin.
* Di sala 2003'an de 26 serlêdan û 8 hevdîtin hatin kirin.
* Di sala 2004'an de 33 serlêdan û 15 hevdîtin hatin kirin.
* Di sala 2005'an de 34 serlêdan û 17 hevdîtin hatin kirin.
* Di sala 2006'an de 25 serlêdan û 13 hevdîtin hatin kirin.
* Di sala 2007'an de 20 serlêdan û 8 hevdîtin hatin kirin.
* Di sala 2008'an de 13 serlêdan û 9 hevdîtin hatin kirin.
* Di sala 2009'an de 17 serlêdan û 15 hevdîtin hatin kirin.
* Di sala 2010'an de 13 serlêdan û 8 hevdîtin hatin kirin.
* Di sala 2011'an de 11 serlêdan û 2 hevdîtin hatin kirin.
* Di sala 2012'an de ji ber 'pêvajo hesas e' 4 serlêdan û 1 hevpeyvîn pêk hat.
* Di sala 2013'an de 25 serlêdan û 14 hevdîtin hatin kirin.
* Di sala 2014'an de 18 serlêdan û 6 hevdîtin hatin kirin.

Di serlêdanên hevdîtina malbatê yên piştî sala 2014'an de ji bilî 3 destûra hevdîtinê û 1 destûra telefonê tu destûr nehat dayîn. Di vê pêvajoyê de ji 459 serlêdanan tenê 3 destûr hat dayîn. Bi piranî biryara dadgehê wekî hincet serlêdanên ku destûr nehat dayîn hat nîşandan.
Serlêdanên malbatê yên piştî sala 2014'an sal bi sal wiha ne:

* Di sala 2015'an de bi hinceta keştî xera bûye 47 serlêdan hatin kirin û destûr nehat dayîn.
* Di sala 2016'an de 77 serlêdan hatin kirin, 1 hevdîtin pêk hat û 76 caran jî hincetên wekî keştî şikestin an jî rewşa hewayê xerab bû hatin nîşandan.
* Di sala 2017'an de 46 serlêdan hatin kirin, ji ber biryara dadgehê destûr nehat dayîn şîrovekirin.
* Di sala 2018'an de 45 serlêdan hatin kirin, lê ji ber biryara dadgehê destûr nehat dayîn.
* Di sala 2019'an de 51 serlêdan hatin kirin, 2 caran destûr hat dayîn, 49 serlêdan jî bi biryara dadgehê destûr nehat dayîn.
* Di sala 2020'an de 57 serlêdan hatin kirin, destûr nehat dayîn, tenê destûr hat dayîn ku telefonek telefon bike.
* Di sala 2021'an de 55 serlêdan hatin kirin, bersiveke erênî û neyînî nehat dayîn.
* Di sala 2022'an de 51 serlêdan hatin kirin, bersiveke erênî û neyînî nehat dayîn
* Heta Hezîrana 2023'an 30 serlêdan hatin kirin lê bersiv nehat dayîn.

Di sala 2024`an de ji destpêka salê heta meha Gulanê 24 serlêdanê malbatê 47 serlêdanê parêzeran bê bersiv hatin hîştin.



# Hêzên Gerîla êrişên artêşa Tirk a dagirker têk dibin

Êrişên dewleta Tirk yên li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê dewam dikin. Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê jî bi taktîkên afirîner êrişên dagirkeriyê têk dibin. Ji her kesî re eşkere ye ku artêşa Tirk li hemberî berxwdana Gerîla di çi rewşê de ye, li çiyayên Kurdistanê ew bê çare maye, ji ber wê ew bi reklaman hewl dide leşker û teknîka xwe serketî nîşan bide, lê li gel şert û mercên giran jî Gerîlayên Azadiyê bi çalakiyên xwe teknîk û hêza leşkerî ya dewleta Tirk a dagirker têk dibe û ji tevahiya cîhanê re isbat dike ku tu hêz nikare vîna şervanên azadiyê bişkîne.

**Çalakiyên Gerîla**

Êrişên dewleta Tirk ên li ser Herêmên Parastinê yên Medyayê dewam dikin. Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê jî bi taktîkên afirîner êrişên dijmin têk dibin. Bi çalakiyên rojên dawî gelek hedefên dijmin îmha kirin. Hêzên gerîla bi taybetî di navbera 1 û 6'ê Hezîranê de çalakiyên bi bandor lidar xistin. Gerîla di navbera 1-6'ê Hezîranê de li Avaşîn, Zap û Metînayê li dijî leşkerên Tirk çalakî kirin, derbên giran li dijmin xistin û 11 leşkerên dijmin ceza kirin. Ya rast, mirovekî bi aqil bi hêsanî dikare fêhm bike û bibîne bê dewleta Tirk di şerê çar salên dawî de di kîjan halî de ye. Lewma rewşa dewleta Tirk ji bilî bêçaretiyê ne tiştekî din e.
Bi reklaman hewl dide leşker û teknîka xwe serketî nîşan bide, lê rastî ne bi vî rengî ye. Rastî ew e ku li gel şer û mercên giran jî çalakiyên gerîla têne kirin ku teknîk û hêza leşkerî ya dewleta Tirk têk dibe. Gerîla di salvegera Pêngava 1'ê Hezîranê de li herêma Avaşînê çalakiyeke sabotajê li dijî dijmin kir. Gerîlayan ku meha fedaiyan meha Hezîranê bi çalakiyên bi bandor pêşwazî kirin, peyameke bi wate dan dewleta dagirker. Li gorî dewleta Tirk li van herêman bi taybetî li herêmên Zap, Metîna û Avaşînê gerîla nemaye! Lê belê em dibînin ku gerîla her roj çalakiyên hîn mezin dikin. Dema ku mirov bala xwe didin ser çalakiyên gerîla, dibîne ku leşkerên Tirk li ku dibin bila bibin, gerîla di wê astê de ye ku dikare êriş bike.

**Her dema ku leşkerên tirk gavê diavêje dibe hedefa gerîla**

Em li herêma Metînayê û çalakiyên gerîla yên li wê derê vegerin. Ji meha Gulanê û vir ve liv û tevgera dewleta Tirk a li herêmê zêde bûye. Vê carê rêbazên nû diceribîne. Dixwazin gerîla li qadê îmha bike, bêbandor bike. Piştre plan dike ku êrişî tunelên şer bike. Di nava çar salên dawî de rê û rêbazek nema ku dewleta Tirk ji bo bikeve nava tunelên gerîla bi kar neanî. Hatin heta ber tunelên şer, lê destvala vegeriyan. Hewl dan bikevin nava çeperên gerîla, lê hatin îmhakirin. Vê carê jî dixwazin xwe li qadê biceribînin, lê belê ev rêbaz jî bê encam dimîne. Gerîlayên Azadiyê yên Kurdistanê şer û çalakiyên xwe dewam dikin. Yanî dewleta Tirk a ku nikare bigihêje armanca xwe, serî li rê û rêbazên dûrî exlaqa şer dike. Lê belê ev rastî piştrast bûye ku ti hêz nikare li hemberî îradeya şervanên azadiyê bisekine. Li Metînayê gerîla êrişî leşkerên Tirk dikin û derbên giran li dijmin dixin. Gerîlayên ku sûdê ji felsefeya



Rêber Apo werdigirin, leşkerên Tirk ên ku pişta xwe bi hêza xwe ya teknîkê germ kiriye, tarûmar dike. Çalakiyên Metîna, Avaşîn û Zapê mînakên herî şênber in. Leşkerên Tirk êdî nikarin li xaka Kurdistanê gavê biavêjin, çeperên xwe nikarin biterikînin. Dewleta Tirk li cihê ku dibêje 'PKK êdî li wir nîne' derbên giran dixwe. Weke ku di dîmenên gerîla de jî tê dîtin, leşkerên Tirk di nava şoqeke mezin de ne û nizane bê wê ber bi ku ve birevin. Gerîla bi taktîkên gerîla yên nûjen ber bi serketinê ve dimeşin. Leşkerên Tirk wê ji têkçûnê nikaribin rizgar bibin. Gerîla hem li qadê, hem li hewayê li ser dijmin serwer bûye. Ji ber vê yekê jî her gava ku leşkerên Tirk ên dagirker diavêje dibe hedefa gerîla.**ANF**

# Ji ber rewşa hejartiyê rêjeya karkirina zarokan zêde dibe

**Ronaz Silêman/Qamişlo**

**Bi boneya 'Roja Têkoşîna li Dijî Karkerina Zarokan' endama Rêveber a Rêxistina Stêrk a Şopandin û Parastina Mafê Zarokan, Perwîn Mihemed diyar kir ku rêjeya karkirina zarokan ji ber rewşa hejartiyê zêde dibe û got, "Pêwîste em zarokan biparêzin û pêşeroja wan ava bikin."**

Di sala 2002`an de Rêxistina Xebatê ya Navneteweyî (ILO) ji bo balê bikşîne ser rewşa neyînî û şert û mercên giran ên ku bi milyonan zarokên li cîhanê tê de dixebitin, roja 12`ê Hizêranê wekî 'Roja Têkoşîna li Dijî Karkerina Zarokan' diyar kiriye. Her wiha çarçoveya "Têkoşîna li dijî karkeriya zarokan"Ji aliyê gelek dewletan ve, weke mijareke sereke hatiye nîşandan. Lê ji aliyê siyaseta desthilatdaran ve zarok di jiyanek nexweş de jiyan dikin, rûbirûyî êriş, zext, tecawizî, siyaseta şer û dagirkeran tê. Tevî piraniya welatan peymana ji bo mafê zarokan îmze kirine, lê zarok li piraniya cîhanê bi taybet jî li herêmên ku şer û alozê jî xilas nabin, bedelên mezin tê dayîn û herî zêde zarok bedelên mezin didin.



**Piraniya zarokan neçarî karkirinê bûne**

Li Sûriyê giştî karkirina zarokan piştî kirîza Sûriyê ya ku di sala 2011`an de hat destpêkirin de her ku diçe zêde dibe. Gelek zarok di karên xeternak de dixebitin. Her wiha encama şer û aloziyan jî gelek kamp hatin avakirin û malbatên ku di kampan de dimînin ji ber ku şert û mercên aborî yên xerab, destûrê didin zarokên xwe yên temen biçûk ku bixebitin. Di heman demê de piraniya zarokên karker neçar bûn ku perwerdehiya xwe di nêvî de bihêlin.
Weke ku her kes nas dike ku Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê rastî şerekî hovane ji aliyê çeteyên herî metirsîdar li ser cîhanê çeteyên DAIŞ`ê hat, lewra di serdema şerê çeteyên DAIŞ`ê de, zarokên vê herêmê bi rengekî hovane dihatin bikar anîn, lê piştî şikenandina çeteyên DAIŞ`ê ji aliyê hêzên QSD`ê ew zarok hin hêviyên xwe yên jiyanî hêvî kirin. Lê dema çeteyên DAIŞ`ê



têk çû, dewleta Tirk a dagirker êdî bû xeyalê metirxîdar ji zarokan re, bi taybetî di herêmên dagirkirî de mîna Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Sipî, zarokên van bajaran piştî ku ji mal û warên xwe koçber bûne, pirî wan bêçare man ku bi temenekî biçûk de kar bikin, da ku di vê rewşa zor û zehmet de karibin xwe bidin jiyan kirin, lê kêleka vê jî, ji perwerdekirina xwe dûr ketin.
Derbarê Roja Têkoşîna li Dijî Karkeriya Zarokan, endama Rêveber a Rêxistina Stêrk a Şopandin û Parastina Mafê Zarokan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Perwîn Mihemed ji rojnameya me re axivî.
Perwîn Mihemed diyar kir ku li cîhanê tevahî cihê şer û alozî lê derketine rewşa jiyana zarokan xerab bûye û wiha got: "Li cîhanê cihê ku alozî û şer heye, zarok bûne qurbanî. Herwiha piştî aloziya Sûriyê ya ku di sala 2011`an de hat destpêkirin rewşa jiyana zarokan zehmet bû. Ev alozî jî bo bandoriya hejatiya pir û bi sedema hejartiyê gelek zarok neçarî karkirinê bûne, lewra rewşên deronî jî li cem zarokan pir bûye. Tevî ku li nayê qebulkirin ku zarok kêmî temenê 18`an kar bikin, lê pir zarok ji ber dê yan bavê wan mirî ne û kesek tuneye kar bikin ji bilî wan, neçarî karkirinê bûn."

**'Zarok pêşeroja civakan e'**

Perwîn Mihemed di berdewamiya axaftina xwe de eşkere kir ku ji bo hemû civakan zarok nirxekî gelek giranbiha ye û wiha got: "Zarok pêşeroja civakan e. Em jî wek Rêxistina Stêrk ya Şopandin û Parastin mafê zarokan bi hemû hewldanên xwe ji bo zarokên Bakur û Rojhilatê Sûriyê kar û xebatê didin meşandin û bi hemû derfetên heyî zarokan diparêzin û çalakiyên cûrbicûr ji wan re lidar dixin, di heman demê de zarokên ku rewşên deronî jiyan dikin, bi wan re dibin alîkar. Her wiha bi boneya roja cîhanî ya Têkoşîna li dijî karkeriya zarokan, em hêvî dikin ji hemû malbatan ku li xwendin û pêşketina zarokên xwe guhdar bin, her wiha rê li pêşiya karkirina zarokan bê girtin û piştgiriyek ji wan re bê dayîn. Pêwîste em bi hev re zarokan biparêzin û pêşerojeke ronî ji wan re ava bikin, ji ber zarok jî di pêşerojê de wê pêşeroja me ava bikin."

**'Zarok tevî mafê xwe rastî pirsgirêkên cûrbicûr tên'**

Endama Rêveber a Rêxistina Stêrk a Şopandin û Parastina Mafê Zarokan li Bakur û Rojhilatê Sûriyê Perwîn Mihemed axaftina xwe wiha qedand: "Berpirsyariya me hemiyan e ku em mafên zarokan biparêzin. Mafê her zarokî/ê heye ku bi jiyaneke ewle bijî, pêş bikeve. Mafê her zarokî/ê heye ku li hember tundî û destirêjiyê bê parastin. Mafê her zarokî/ê heye ku raman û hestên xwe bîne ziman. Lê mixabin li gelek deverên cîhanê zarok tevî mafê xwe rastî pirsgirêkên cûrbicûr tên."

# 'Bi armanca naskirina ramanên Rêber Apo pirtûkên wî tên xwendin'

Endamê Akademiya Rêber Apo Yûsif Kûtê diyar kir ku di çarçoveya berdewamiya pêngava 'Ji Rêber Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî' kampanyaya 'Rojên Xwendina Pirtûkên Abdullah Ocalan' hat destpêkirin û got, " Xwendin û naskirina pirtûkên Rêber Apo naskirina pirsgirêkên mirovahiyê ye."

**Navenda Nûçeyan/Qamişlo**

Rêberê Gelan Abdullah Ocalan 26 sal in li Îmraliyê dijî tecrîda mutleq bexwedaneke bêhempa dimeşîne û zêdetirî 39 mehane agahî jê nayê wergirtin. Fîlozofên xelatgirên Aştiyê ya Nobelê, akademîsyen, rojnameger, saziyên rêxistinên sivîl, partiyên siyasî, parlamenter, aktîvîst, nûnerên saziyên jinan û kesên nav û deng di 10`ê Cotmeha 2023`a de li 74 navendên cîhanê pêngava 'Ji Rêber Abdullah Ocalan re azadî, ji pirsgirêka kurd re çareseriya siyasî' dan destpêkirin.
Di çarçoveya pêngava azadiyê de dostên gelê kurd di 10`ê Kanûna 2024`an de kampanyaya 'Rojên Xwendina Pirtûkên Abdullah Ocalan' dane destpêkirin. Gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî bi awayekî çalak tevlî kampanyaya ku li qada navneteweyî hatiye destpêkirin, dibin. Weke li hemû bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê, li bajarê Qamişlo jî xwendina pirtûkên Rêberê Abdullah Ocalan ku ji aliyê Akadimya Rêber Apo ve ev xebat hatiye plankirin tê xwendin.
Derbarê komên ku pirtûkên Rêber Apo dixwînin, endamê Akadimiya Rêber Apo ya Zanistên Civakî Yûsif Kûtê ji rojnameya me re axivî.
Yûsif bilêv kir ku niha pir kes meraq dike, Rêber Apo kî ye? Pirtûkên wî behsa çi dikin û wiha got: "Rêber Apo



bi rêberê gelê Kurd dihat naskirin, lê dema pirtûkên wî hatin xwendin cîhan hemû ji bo azadiya wî ya fîzîkî kete nava liv û tevgerê. Rêber Apo niha bûye Rêberê Gelan. Rêber Apo qeyranên mirovahiyê yên ku îroj tê jiyan kirin, di nava pirtûkên xwe de bi kûrahî lêkolîn kiriye, lewra çareserî jî bi kûrahî daniye holê. Rêber Apo di bin navê manîvîstoya şarestaniya demokratîk bi rengê 5 parêznameyên ku hev tem dikin mîna Civakên Kapîtalîzim, Parastina gelekî, Rojhilata Navîn, Sisyolojya azadiyê û çareserkirina pirsgirêka kurd di hundirê zindana îmraliyê de, nivîsandin."

**'Bi 10`an komên xwendinê hatine avakirin'**

Yûsif Kûtê diyar kir ku di çarçoveya pêngava cîhanî ya ku ji bo azadiya Rêber Apo di sala 2023`an de hatibû destpêkirin û di nav pêngavê de gelek çalakiyên cûrbicûr pêk hatin, yek ji wan çalakiyan jî, xwendina pirtûkên Rêber Apo ne û wiha got: " Da ku pirtûkên Rêber Apo di nava gel û cîhanê de bêtir bên naskirin xebatek jêre pêwîst bû, ji ber helbet kesên dest bi vê pêngavê kirin, ew bixwe ramanên Rêber Apo xwendibûn. Ji bo wê me xwest ev raman hîn bêtir bê belavkirin, lewra bi 10`an komên xwendinê li hemû bajarên Bakur û Rojhilatê Sûriyê de hatin avakirin. Hejmara van girûpan ne wek hevin, ji 5 kesan heyan 15 kesan û zêdetir pêk tê û di nava koman de gel û endamên saziyên bajêr yên hemû pêkhateyan cihê xwe digirin. Her wiha tevkîbûna ji koman re li pêşiya her mirovekî vekiriye, ji ber armanca me naskirina fikrê Rêber Apo ye."

**'Sisyolojiya azadiyê eşkerekirina hemû pirsgirêkan e'**

Kûtê anî ziman ku pirsgirêkên ku niha cîhan tevahî pêre derbas dibe Rêber Apo di pirtûka Sisyolojiya de eşkere kiriye û çareserî jî derxistiye holê û wiha got: " Li Herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi giştî çalakiyên xwendina pirtûkên Rêber Apo pêk tê. Niha me jî li bajarê Qamişlo 3`ê komên xwendina pirtûkên Rêber Apo li aliyê rojhilat û rojava ava kirine. Di demên pêş de hewldanên me hene ji bo zêdekirina hejmara giropan. Her wiha destpêkirina xwendina me ji pirtûka 3`yan a bi navê Sisyolojiya azadiyê re ew bû ku ji bo çareserkirina pirsgirêkên ku îro roj hene, mîna pirsgirêkên civakê, desthilatdarî û Rêveberî, welatparêzî, pirsgirêkên dîrokê, ekolojîk, pirsgirêkên jin û ciwanan pir pirsgirêkên ku hene û bingeha wan kaptalîzim e, Rêber Apo di hêla felsefî de lêkolîn kiriye, hem jî ji bo wan çareserî derxistiye holê."

**'Li Rojhilata Navîn şer di navbera Kaptalîzim û serdema demokratî tê kirin'**

Endamê Akadimiya Rêber Apo ya Zanistên Civakî Yûsif Kûtê axaftina xwe wiha qedand: "Di Rojilata Navîn de şer di navbera fikirê kaptalîzimê û fikrê demokrasiyê tê meşandin. Projeya Neteweya Demokratîk ya ku Rêber Apo bi wê bang kiriye, ew proje dawî anîna hemû şera ne, lewra Rêber Apo ji aliyê dewletên Kaptalîzm û dewleta Tirk ve hat armancgirtin. Lê bersiva ku îro roj ji bo dewletên kaptalîzm û dewleta Tirk a dagirker tê dayîn, pêkanîna hişmendiya Netewa Demokratîk e, pêkanîna projeyên Rêveberiya Xweser ên ku îro li herêma Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hizireke azad û pêşketî tê avakirin."

# 'Ji bo pêşxistina qada diplomasî kar û xebat berdewam in'

**Ayşa Silêman/Qamişlo**

**Berdevkê Desteya Têkilyên Derve ya Rêveberiya Xweser ya Kantona Cizîrê Kemal Akif diyar kir ku di qada trafîka diplomasî de ji bo sala 2024'an bi giştî ji aliyê wan ve pilansaziyeke berfireh hate danîn û dest bi bêngavekê hat kirin.**

Di derbarê kar û xebatên diplomasî yên Rêveberiya Xweser a Herêma Bakur û Rojhilat û Berdevkê Desteya Têkililyên Derve Ya Rêveberiya Xweser Kemal Akif bersiva pirsên Rojnameya me dan û hevpeyvîn wiha bû:

**-Heta niha di kar û xebatên we yên diplomasî de çi guhrtin û veguhertin hene, pêşketinên ku çêbûyîn li ser asta Ewropa bi giştî çine?**

Li gor pîlan nameya sala 2024'an gelek hevdîtin û dan û satandin çêbûn, ev yek ji bo pêşxistina rol û mesyona Rêveberiya Xweser di hundirê sûriyê de. Di heman demê de ji bo çareseriya demoqratîk li ser çi esas û bingehî divê pêşvikeve. Li gor hevdîtin û dan û standinên ku çêdibin heta niha çi aliyên ku hevdîtin bi wan re hatî kirin, gihane baweriyekî ku Rêveberiya Xweser bingeheke gelekî xurte di rewşa sûrî de. Li ser vî esasî hîn hevdîtin û pilan nameya îsal berdewame, em hewil didin ku ew biryarên ku me ji qada diplomasî girtibûn ji destpêka sala 2024'an heya dawiya wê bi encamên baş bidest bixin. Hevalên me jî yên qordînasiyona Ewropa jî kar û xebatên xwe li ser vî esasî jî dikin. Ji meha Pûşber û şûnde pêngaveke berfireh heya di aliyê diplomasî û siyasî de li Ewropa, hevalên me yên li Ewropa û yên wezareta Têkiliyan wê dest bi vê pêngavê bikin.

**-Ber bi dewletên erebî ve beriya niha çûn û hatinên we hebûn yan na, sedemên wê çibûn?**

Sûriyê di Rojhilata Navîn de di cihekî cixrafî pir girîng de ye. Rêveberiya Xweser jî parçeyek gelekî girîng ji hundirê Sûriyê ye. Em tu carî xwe ji pirsgirêka Sûrî venaqetînin ji ber ku em jî vê yekê jiyan dikin. Li ser vî esasî dewletên Ereb yên ku di Rojhilata Navîn de xwedî mîsyonek pir girîngin û xwedî bandorin di hundirê Sûrî de. Ji ber vê yekê baweriyek me heye, heger em dan û satndineke baş û saxlem bi dewletên Ereb re bikin, wê demê mirov wê bikaribe roleke erebî bi giştî bixwe xizmeta rewşa ku niha Sûriyê tê re derbas dibe. Da ku ev rol bibe xizmet kar ji bo çareseriya pirsgirêka siyasî di hundirê Sûrî de. Loma em gelek girîngiyê didin dewletên Erebî, da ku bibin xwedî rol û misyon di hundir Sûrî de. Di heman demê de Sûrî jî di rewşekî de ye, ku hemû dewletên derdorê him bi vê rewşê bandor dibin him jî bandor lê dikin. Di nav pêngava me ye ku em ê dest pê bikin hin dewletên ereb jî di nav pîlan nameyê de ne, pêwîste sardana û hevdîtin bi wan re çêbibin.

**-Welatên ku hûnê serdana wan bikin çi ne û hûn vê yekê çawadigrin dest?**

Pîlan nameya Rêveberiya Xweser heye ku bikaribin têkilî û dan û standinê bi hemû dewletên Ereban re bikin. Heger em dewletan binav bikin hin dewletên



Kendafê dan û standinên me bi wan re hene. Herwiha di demên nêz de wê sardana wan jî were kirin. Lê em wek Rêveberiya Xweser dibînin pir girînge ku em têkiliyên xwe bi hemû dewletên Ereban pêşbêxin.

**-Bandora van kar û xebatên diplomasî li ser çareseriya pisgirêka Sûriyê bi giştî wê çibe?**

Pêwîste dan û standineke saxlem çêbibe heta ku encamên baş bidest werin xistin. Da ku ev encam bikaribe xismeta çareseriya pirsgirêka siyasî di hundirê Sûrî de bike. Di heman demê de di vî milî de baweriyeke me jî heye ku em çiqasî bikaribin têkiliyan pêş bixin hewqasî em dikarin hemû hêzan kom bikin, da ku bixin di bin xizmeta neştecihbûn û çareseriya siyasî di hundirê Sûrî de.



## Hilbijartin bêyî sindoqan serkeftin anî!

**Dilyar Cizîrî**

Komseriya Bilind a Hilbijartinan a Bakur û Rojhilatê Sûriyê hilbijartinên şaredariyan ku dihat payîn di ku di 11'ê vê mehê de hatibana lidar xistin, ji bo meha Tebaxê paş de hate xistin. Ev piştî daxwaznameya hejmarek partiyên siyasî û komên beşdarî hilbijartinan bûne, pêk hat. Li gorî pîvanên demokrasiyê û li gorî hevpeymana civakî ya Bakur û Rojhilatê Sûriyê paş de xistina hilbijartinan ne tiştekî şaşe.
Şêniyên Bakur û Rojhilatê Sûriyê bi hemû pêkhateyên xwe ve jî ne li dijî paş xistina hilbijartinan e. Dibe ev gav derfetekî baştir ji bo namzet, kom û partiyên siyasî vebike. Di heman demê de gelê herêmê jî dikare baştir namzet û komên ketine hilbijartinê lêkolîn bikin.
Mijara me ya sereke ji xwe ne paşxistine, mijara sereke ku bala mirovan dikşîne, çima dewleta Tirk, hikûmeta Şamê û heta hin hêzên mezin ewqas bi hesab û tirs nêzî van hilbijartinan dibin. Divê her ferdek ji Bakur û Rojhilatê Sûriyê vê pirsê ji xwe bike. Heger hilbijartin çêbûn, wê çi guhertin pêk were? Gelo wê bi van hilbijartinan kurt û kêmasiyên di Rêveberiya Xweser de hene, ji holê rabin?
Em ê ji pirsa dawî destpê bikin, li gorî hevpeymana civakî wê rola meclîsa şaredariyan were zêdekirin. Wê biryarên xizmetguzarî û hemû xalên girêdayî bajar, gund an navçeyan girêdayî wê be. Ev wê bîrokratiya ji zihniyeta dewletê derbasî gelek saziyên me bûne, ji holê rabe. Dê têkiliya Meclîsa Şardariyê yekser bi komînan re be. Li gorî buceya xwe wê pirojeyan li gorî pêwîstiyên bajar pêk bînin. Nabêjim ji sedî sed, lê bi van hilbijartinan dibe hemû pirsgirêkên heyî çareser bibin. Bê guman ev jî wê bi derfetên Rêveberiyê ve girêdayî be.
Di aliyê siyasî de li gorî biryara Neteweyên Yekbûyî ya 2254 hilbijartin mafekî rewa ye. Dikare ji bo çareseriya aloziya li tevahî Sûriyayê bibe zemînekî bingehîn. Ji ber wê jî beriya gefên dewleta Tirk û îdayên reşkirinê yên hikûmeta Şamê Koalîsyona Navdewletî û di serî de Dewletên Yekbûyî yên Amerîka erênî nêzî lidarxistina van hilbijartinan bûn. Lê piştî gefên dewleta Tirk a dagirker ku di asta herî jor de pêk hatin, wan daxuyaniyên cûda dan û nêrînên xwe guhertin.
Êdî ji her kesî ve diyare di serî de dewleta Tirk û Hikumeta Şamê ji van hilbijartinan ditirsin. Ew naxwazin riyên çareserî û demokrasiyê ji bo aloziya Sûriyayê pêk werin.
Ji ber wê jî ewqas êrişî xebatên hilbijartinan dikin. Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê ku îro ji tevahî gelê Sûriyê re bûye nimûneya çareseriyê peyama xwe ya ji bo demokrasiyê da. Bi biryar jî diyar kir tekane riya çareseriyan hilbijartin û xwe nûkirine.
Di nêrîna min de bêyî hilbijartin werin lidarxistin, serkeftina îradeya gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê diyar dibe. Dibe hin alî paşxistin û heta ne lidarxistina hilbijartinan bi gefên dewleta Tirk ve girê bidin. Hinan jî dixwazin wekî biryara refurandoma 2017'an a li Başûrê Kurdistanê bi nav bikin. Ev hilbijartin ne wekî refurandoma Başûrê Kurdistanê ye. Heger Rêveberiya Xweser hilbijarinan çêke yan çêneke, serkeftina bi dest xistiye.



# Sûc û kiryarên cendirmeyên artêşa Tirk a dagirker li ser sînorê Sûriyê

Piştî destpêkirina aloziya Sûriyê, Artêşa Tirk a dagirker li dijî penaberên Sûriyê li ser Sînor tevahiya cûreyên kiryarên dijmirovî pêk tîne û zagonên parastina mafên penaberan a navneteweyî binpê dike. Li gorî raporan heta niha 562 penaberên sûrî li ser destê cendirmeyên dewleta Tirk hatine kuştin.

**Birûc Resûl/Qamişlo**

Bi destpêkirina kirîza Sûriyê re dewleta Tirk a dagirker bi tevahiya hêza xwe destwerdana kirîzê kir û ji bo pêkanîna berjewndiyên xwe hewil da tevahiya gelên herêmê koçber bike. Li aliyekî destek da çeteyan û li din jî gelek herêm dagir kirin û veguherandin navendên kiryarên dijmirovî. Li aliyê din jî li ser sînor dagirkeriya Tirk penaberan bi awayekî raste rast qetil dike û tevhiya zagonên navneteweyî binpê dike.

**Hedefgirtina Penaberan**

Li ser sînorê Sûriyê û Bakûrê Kurdistanê û Tirkiyê bûyerên hedefgirtina penaberan zêde bûye û gihiştiye rewşeke metirsîdar. Cendirmeyên Tirk bi awayekî raste rast penberan dike armanc û bi guleyên rastî wan dike hedef. Herî dawiyê ciwanekî bi navê Yehya Ehmed El-Xemîs, 23 salî ku xelkê gundê Hîmo yê bajarê Qamişlo ye, dema dixwest ji sînorê Tirkiyê li nêzîkî bajarê Serê Kaniyê derbas bibe, hat kuştin. Ev bûyer ne bûyerek yekemîne, ji ber ku binpêkirinên bi vî rengî plankirî pêk tên.

**Bîlançoye tirsnak**

Ji destpêka kirîza Sûriyê û heta 9`ê Hezîrana 2024`an hejmara penaberên Sûrî ku bi guleyên cendirmeyên Tirk hatine kuştin 562 ne, di nav wan de 106 zarok di bin 18 salan re ne û 69 ji wan jî jin in. Ji bo derbasbûna sînor an niştecihên gund û bajarokên sînorî yên Sûriyê Cotkar û xwediyên zeviyên li kêleka sînor bi guleyên rastî ji aliyê cendirmeyan ve tên hedefgirtin. Ji



destpêka sala 2024`an, cindermeyên Tirkiyê 9 koçber kuştin e û 30 jî birîndar kirin e.
Di sala 2023 'an de cendirmeyan di dema hewildana derbaskirina sînor de 41 kes kuştin û zêdetirî 133 kesan jî birîndar kirin, herwih dema girtina penaberan pêştî işkenceyên giran û hovane penaberan dersînor dikin.
Di sala 2022'an de jî cendirmeyên parastina sînor yên Tirkiyê 48 koçberên Sûrî ku 5 jê zarok û 2 jin bûn, li herêmên cuda yên Sûriyeyê li ser sînorê Tirkiyê kuştin û 121 jî birîndar kirin ku ji wan 36 zarok û 40 jin in. Herwiha gund û herêmên nêzî sînor jî bi awayekî plankirî ji aliyên cendirmeyên dagirkeriya Tirk a dagirker ve tên hedfgirtin.

**Îşkence heya mirinê**

Dagirkeriya Tirk ne tenê bi guleyan, bi riya işkence û destdirêjiyê jî penaberan qetil dike û li dijî wan gelek kiryarên hovane dike. Cendirmeyên Parastina Sînor yên Tirk li gundewarê Idlibê ciwanekî ku beriya niha bi darê zorê ji Tirkiyê hatibû dersînorkirin hedef girtin û di encamê de dema ku hewl dida bi rêya rêyên qaçax vegere malbata xwe li Tirkiyê hate kuştin, Şahidê bûyerê nîşan didin ku gelek penaberên hatine girtin bi êşkenceyeke giran jiyana xwe ji dest dane.

**Şahidên xelasbûyî**

Şahidên ku ji destên cindermeyên Tirk hatine rizgarkirin nîşan didin ku cendermeyên Tirk bi zanebûn li dijî penaberan şîdeteke zêde bi kar tînin û wiha gotin: "Dema me xwest ji sînor derbas bikin, bêyî hişyariyekê bidin gule li me reşandin. Min bi çavên xwe dît ku hevalên bi me re dikevin erdê û ez bi şens bûm ku sax mam." Di van şahidiyan de hovîtiya mezin ya bi penaberan re rû bi rû ye, radixistin pêş çavan.

**Berpirsiyariya Zagonî**

Li gorî qanûnên navneteweyî, qanûna parastina penaberan û misogeriya mafên wan yên bingehîn ku dikeve ser mile dewleta Tirk, di nav de jî mafê jiyan û ewlehiya fîzîkî ye. Hevpeymana Netewên Yekbûyî ya di sala 1951`an de ya taybetî rewşa penaberan ku Tirkiyê jî aliyeke di vê peymanê de ye, tê de hatiye diyrkirin ser divêtiya parastina penaberan û redkirina vegerandina bi zorê li cihên ku jiyana wan dikeve xeteriyê de. Binpêkirinên berdewam ji hêla cindirmeyan berovajî pabendbûna peymanê ye.

**Bertekên navneteweyî**

Tirkiyê ji bêdengî û bêhelwestiya li hemberî binpêkirinên civaka navdewletî sûd werdigire da ku kiryarên xwe li dijî koçberên Sûriyeyê berdewam bike. Girîng e civaka navneteweyî û welatên di şerê Sûriyeyê de çalak in zextê li wan bikin ku binpêkirinên Tirkiyeyê yên li dijî koçberên Sûriyeyê rawestînin û serî hildin, lêpirsînên lezgîn vekin û ji berpirsyarên van sûcan hesab bixwazin. Her wiha raporên ku van binpêkirinan belge dikin û daxwaza bidawîkirina wan dikin, radestî Neteweyên Yekbûyî hatine kirin.

**Hejmara penaberên Sûriyê ku bi guleyên cendermeyên dewleta Tirk a dagirker hatine kuştin**

Li gorî rapor û belgeyên saziyên mirovî yên herêmê hijmara penaberên Sûrî ku ji destpêka kirêza Sûriyê ve li ser destê cendirmeyên parastina Sînor yên dewleta Tirk hatine kuştin û birîndar bûne wiha ne:
-562 kes li ser destê cendirmeyên Tirk hatine kuştin, ji wan 106 zarokên di bin 18`e salî 69 jin in.
-3 hezar û 109 kes jî dema hewl didan sînor derbas bikin û di nava wan de niştecihên gundên nêzî sînoran ji aliyê cendirmeyên Tirk ve hatin gulebarankirin û birîndar bûne.

## Di hembêza Tirkiyê de muxalefetî nabe



**Zekî Bedran**

Erdogan ji 2014'an ve di çarçoveya "Plana Çalakiya Çokşikandinê" de êrişên xwe yên li ser Kurdan dimeşîne. Li gel ku hilbijartina 31'ê Adarê winda kir, bû partiya duyemîn jî dest ji israra xwe ya di şerê li dijî Kurdan de bernade. Ji bo gelê Tirkiyê berdêla vî şerî giran bû. Tevahî destkeftiyên demokratîk ji holê hatin rakirin. Li holê tiştek bi navê hiqûqê nema. Dadgeh di destê desthilatê de bûne amûrek bênirx. Ragihandinê li dijî gel xebitî, rastî berovajî kirin û bû hevkarê tevahî sûcên desthilatê.
Di demê dawî de piştî hilbijartinên şaredariyan ên Bakur û Rojhilatê Sûriyê ketin rojevê, destpêkê Baxçeliyê faşîst û piştre Lijneya Ewlehiya Netewî hilbijartin kirin armanc, daxuyanî dan. Dewleta Tirk li aliyekî li herêmên dagir kirine hikumeteke demkurt û Artêşa Netewî ya Sûriyê ava dike, li aliyê din jî propogandaya parastina yekbûna axa Sûriyê dike. Hewl dide herêmên dagir kirine tevlî sînorê xwe bike, li aliyekî qîr dike û dibêje Kurd dixwazin li Sûriyê dewletê ava bikin, em li dijî wan disekinin. Berovajîkirin û demagojiyeke bê sînor dikin.
Dema gelê Bakur û Rojhilatê Sûriyê xwest hilbijartina şaredariyên xwe bike, bi vê hinceta şer li herêmê û cîhanê ferz dike. Dema gel şaredariyên xwe bi hilbijartinê rêve bibe, rêyên demokratîk bikar bîne, dê çima ev Tirkiyê aciz bike? Tevahî hewldan û lêgerînan bi terorbûyînê demxe dike û êriş dike. Dema bîrên petrolê, cihên gazê û elektirîkê topbaran dike, raporan dide DYE û hêzên din û dibêje "Ev yên PKK'ê ne. Pere diçin Qendîlê" û hêncetan çêdike. Li Tirkiyê Kurd şaredariyan li gorî zagonan qezenç dikin, ji wê re jî dibêje "Ev pişta xwe didin Qendîlê" û şaredariyên gel desteser dikin. Qendîlê weke şeytan nîşan didin û hewl didin tevahî sûcên xwe bi wê veşêrin. Gelê Çolemêrgê kesên ji xwe û baş nas dikin hilbijartin. Weke ku gel tune ye, deng bikar neaniye serokê şaredariyê ji erk digirin. Hêncet dîsa heman e. Erdogan dibêje dê dest danin ser şaredariyên din jî û ji bo vegotinê jî tu pirsgirêkê nabîne.
Ragihandina Tirk û rêveberên wê hilbijartinên Bakur û Rojhilatê Sûriyê xistine armanca xwe. Jixwe dihat zanîn ku ji bo êrişên li ser Rojava û Başûr amedekarî dikirin û li benda demê bûn. Niha dê hilbijartinan li ser hêncetên xwe zêde bikin.
Li kêleka van ya balkêş helwesta hinek aliyên xwe weke muxalefeta hikumeta Sûriyê didin nîşan, bûne sîxwir û piyonên dagirkeran. Aliyên ji xwe re dibêjin hikumeta demkurt a Sûriyê jî gotinên rayedarên Tirk bikar tînin û li dijî demokrasî û Kurdan ketine tevgerê. Ew jî weke saziyên şerê taybet dibêjin, "PKK'ê Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagir kiriye. Dixwaze bi hilbijartinên şaredariyan re xwe rewa bike. Dixwaze dewleta terorê ava bike. Em li dijî hilbijartinan in".
Tirkiye dibêje ez alîgirê yekbûna Sûriyê me. Bang li Beşar Esad dike û dibêje, "Were em hevdîtinan çêbikin, Kurdan ji holê rakin". Li aliyekî jî li dijî Esad hikumetê çêdike. Li dijî artêşa Sûriyê Artêşa Netewî ya Sûriyê ava dike. Ragihandina Tirk nûçeya ku li Efrînê ji bo Artêşa Netewî ya Sûriyê Dibistanek Şer ava kiriye çêdike. Yên ku dibêjin em muxalefeta Sûriyê ne di hembêza Tirkiyê de li dijî kê hatine biçekkirin? Li herêmên dagirkirî weke kerên mayînan tên bikaranîn. Dê di hembêza dagirkeran de çawa bibin muxalefeta Sûriyê? Ev hêzên ku nasnameya xwe ya siyasî winda kirine, bi temamî ketine bin fermana dewleta Tirk de çawa dikarin xwe weke muxalefeta Sûriyê binav bikin?
MSD, QSD û Rêveberiya Xweser bi hevkarî li Hesekê ji pêşengên gel û eşîran re civînek çêkirin û helwesta xwe nîşan dan. MÎT'ê demildest li Ezazê civînek li dijî wê lidar xist. Van jî li dijî hilbijartinan helwest nîşan dan. Halbûkî kesên beşdarî van hilbijartinan bûne ji xwe li herêmên ku dê hilbijartin lê çêbibin najîn. Partiyên van û rêxistinên van tune ne. Tu sedem û pêwîstî tune ye ku ev li dijî hilbijartinan helwestê nîşan bidin. Sedê sed ev civînek a MÎT'ê bû. Lê van aliyan bikar tînin, dixwazin şer û pevçûnan, fitneyê bixin nava gelê herêmê.
Dewleta Tirk, DYE jî di nav de tevahî hêzên mezin bi gotinên hûn çek û piştgiriyê didin PKK'ê di bin zextê de digire, hewl dide li dijî Kurdan bixe tevgerê. Li Sûriyê pêşiya rêyên siyasî yên çareseriyê digire. Li herêmên dagirkirî hinek aliyan bikar tîne, hewl dide tevlîheviyê çêbike û şerê hindirîn birêxistin bike. Ji ber vê yekê pêwîste gelên Sûriyê li hemberî xebatên xeternak û wêranker ên dewleta Tirk, li hemberî êrişên wan hişyar bin û hevdû bihêz bikin.
Pêwîste rêveberiya xweser û hêzên demokratîk kampanyayek bihêztir a siyasî û dîplomasiyê bimeşînin. Pêwîste destwerdana Tirkiyê ya ji bo karê hindirîn ên Sûriyê bê astengkirin, ji bo bidawîkirina dagirkeriyê xebatek bênavber bê meşandin.



## Karmendên Mêtingeriyê

**Farûk Sakik**

Di van salên dawî de piştî hilbijartinên şaredariyan dewleta dagirker, karmendê xwe dişîne ser şaredariyên gel û desteser dikin. Ev dagirkerî xwe dispêre çanda 'Plana Islahkirina Şerqê'.
Piştî şerê yekem ê cîhanê li axa Anatoliya Tirkitî har bû. Ji bo netewek nû-pan Tirkîzmê ava bikin berê xwe dan neteweyên dinan. Diviya wan tunebikirina. Netewên ku ne misliman bûn bihatina qirkirin yên ku Misliman bûn jî, wek Kurdan wê bihatina asîmîle kirin. Wisa jî kirin. Me di dîrokê de ji aqûbeta Ermenan re şahidî kir.
Ji bo asîmîlasyona Kurdan jî di 25'ê Îlona 1925'an de planek bi navê 'Plana Ishahkirina Şerqê' pêşkêşî meclisê kirin. Plan ji 5 beşên sereke pêkdihat. Di beşa 4'an de wiha dihat gotin: "Qedexekirina bikaranîna zimanên ne-tirkî û qedexekirina îstihdamkirina Kurdan di asta duyemîn de be jî." Diviya yek Kurdek nebûya memûrek ji rêzê jî. Di dewsa memûrên Kurd te rêvebireyek ji kesên nijadperest û kesên Tirkbûn qebûl kirine re were avakirin. Mufetişên ûmûmî şandin heremê. Ji xwe ev rapor jî ji aliyên wan ve hatibû amadekirin.
Çima serî li vê rêbazê asîmîlasyonê didan? Dixwestin tu tiştek aîdiyeta Kurd û Kurdistanê nemîne. Ziman, govend, cil û berg, dîrok, navên gund û bajaran, navên zarokan û hwd..
Di planê de dihat gotin ku Kurd van motivên xwe yên netewî ji bîr nekin di pêşerojê de wê di hîsyata wî de kurdbûnê carek dina zîndî bibe. Divê ku bi demê re nifşa nû êdî xwe wek Tirk bibîne. Ev destpêka asîmîlasyonê bû.
Asîmîlasyona ku bi Plana Islahkirina Şerqê destpêkiribû êdî hatibû radaya ku plana wan biserbikeve. Lê tevgera azadiyê bi têkoşînek salan û bi berdêlên mezin pêşî li vê yeke girt. Destûr neda ku ev asîmîlasyon bigihîje armanca xwe.
Piştî siyaseta demokratîk, ji sala 1999'an ve li Kurdistanê hin şaredarî bi dest ketin. Ev şaredarî şaredariyên gel bûn. Di rêveberiyêde, gel jî cîh digirt. Şaredariyên ku Kurdan bi dest dixistin, berevajiyê vê Planê, xebatên ku netewa Kurd û Kurdistanê ji asîmîlasyonê diparastin dikirin. Şaredariyên gel ji destpêkê ve şopên asimlasyonê paqij kirin û ji bo parastin û pêşvexistina Kurd û Kurdistan xebat meşandin. Di warê çand û ziman de pêşketinê mezin çêdibûn. Dewleta dagirker û qirker ev yek dîtin. Dest bi êrişan kirin. Di destpêkê de hin şaredar jî peywir girtin. Lê şaredarî, şaredariyên gel bûn û xebatan jî dewam dikir. Di demek waha de Plana Islahkirina Şerqê û Mufetîşên Ûmûmî hat bîra wan.
Di sala 2016'an de di hedefa wan de şaredariyên gel hebûn. Mufetîşên nû wek qeyûm binavkirin. Lê ew karmendên mêtîngeriyê bûn.
Çiqas şaredariyên gel hebûn desteser kirin. Karmendên xwe anîn li wan şaredariyan bicîh kirin. Rêveberî ji gel hat girtin û radestî çeteyan kirin. Çeteyên di planê de wek kesên xwe wek Tirk dibin, dikarin di rêveberiya heremê de cîh bigirin. Îro jî ji van kesan Kurdên û bi AKP'ê re tevdigeriyan.
Me got ya, dema ku şaredariyên ketine dest gel, ji çand û zimanê Kurdî dest bi xebatên xwe kirin, van Karmendên Mêtînger jî di destpêkê de êrişî van xebatan kirin.
Lê wê tucarî bi ser nekevin. Bi têkoşîna tevgera azadiya Kurdistanê re, êdî rihek netewî hatiye afirandin. Êdî plana wan a islahkirina şerqê jî qayûmkarmendên mêtîngerî jî nikaribin Kurdan asîmîle bikin.